

Ji bo her dengekî êşmarek Ber bi klavyayeka nû va

Pêşgotin

Klavya (keyboard, Tastatur) ew'e ku mirov bi tiliyên xwe li gupikên wê dide û tîpa ku dixwaze li ser ekrana komputer dinivîsîne. Piştî mijara ku tê nivîsandin temam dibe, nivîs tê embarkirin û parastin. Di roja îro da nivîsîna li ser kaxetê êdî pir kêmtir tê bikaranîn. Piraniya nivîsan bi komputer pêktê. Ji lew ra, her welatekî – ji bo nivîsandina zimanê xwe'yî fermî klavyayek li gor tîp û dengên zimanê xwe daniye. Bê guman, berî heyama komputer nivîsîn fermî bi **tilînivîsê** (dektîlo) dihatin nivîsandin. Hejmara gupikên tilînivîsê ji hejmara tîpên ziman, îşaretên nuqteşaniyê, hejmarên 0 heya 9 û hin îşaretên din yê pêwîst pêkdihat. Bi arîkariya gupika şift (shift, schift) mirov dikarîbû li cihê gupikên ji bo tîpên biçûk, tîpên gir û li cihê hejmaran hin îşaretên din wek „ !, „ , \$, \$, %, /, (,), =, ? „ binivîsîne. Bi gelemperî heya niha jî hên ev sîstem di klavyayên komputeran serdest'e.

Berê **tilînivîsên** dewra pêşîn wisa hatibûn duristkirin, ku her gupikeka klavyayê, bi bistiyekekî yan destikekî va wisa hatibû girêdan, gava mirov li gupikê dida, ew destik diçû li şerîta bi boyax diket, ku li pêşiya kaxezê bû û wisa ew tîp li ser kaxezê dihate nivîsandin. Her destikek wisa hatibû eyarkirin, ku her carê bi lêdana her gupikekê ra, tîpa ku mirov dixwest binivîsîne li ser kaxezê dihate çapkirin û kaxez bi gavekê pêşve diçû. Sîstema tilînivîsê bi giştî wisa bû, ku mirov dikarîbû her tîp, yan her îşareta ku di tilînivîsê da heye, bi kar bîne. Ji ber vê yekê her tilînivîsêkê tenê şêweyekî xwe yê tîpan hebû û mirov nikarîbû şêweyê nivîsînê(font) biguhêre. Di pey ra hin tilînivîsên elektirîk û nûjen peyda bûn, ku hemû tîp û îşaret li ser gokekî ji mêtal hatibûn danîn; ew gok jî wek seriyekî li tilînivîsê dihate siwarkirin. Bi her lêdanekê ra gok bi lez dizivirî û bi temamî ew tîp yan ew îşareta ku hatibû lêdan, li ser kaxezê dihate nivîsandin. Bi guhertina gokê pêşîn bi yekî din, ku tîpên li ser hatine danîn bi awayekî din bûn, mirov dikarîbû şêweyê nivîsînê(font) hinekê biguhêre. Lê tevî wê jî, îmkanên ku hebûn pir bi sînor bûn. Tiştê herî nebaş ew bû, heger mirov bixwesta hin peyvên di nivîsa xwe da biguhêre, diviyabû ji wî cihî da heya bi dawiya nivîsê ji nû da binivîsîne.

Di sîstema komputeran da klavya bi giştî înfomasiyona xwe bi awayê software ji fonta ku hatiye hilbijartin distîne û ew tîp yan jî ew îşaret bi şêweyê ku di font da hatiye danasîn li ser ekrana komputerê tê nivîsandin. Ji lew ra, îro ew îmkan peyda bûne, ku mirov dikare nivîsara xwe bi gelek fontên cuda û cawaz binivîsîne. Lê belê ew font jî dîsa wan kesan çêkirine,

ewên ku di destpêkê da komputer ji bo xwe bi kar anîne û wê hîngê hên hesabê hemû ziman û gelên din nekiribûn.

Çawa teknîka komputer di warên hardware û software da zû pêşve çû, wisa jî bikaranîna wî pir bi lez li seranserê cîhanê belav bû. Ji bo zimanên ku bi tîpên latînî dinivîsîn, êdî gelek font hatine peydakirin. Bê guman, hebûna pir fontan dewlemendiyekê û gava mirov ji kîjan şeweyê tîpan hezbike, dikare wê fonta ku dixwaze hilbijêre û nivîsa xwe pê binivîsîne.

Komuterên pêşîn li ser bingeha 16 bit (8 byte) dixebitîn. Ev jî dibû sedem, ku hejmara îşaret û tîpên têvel (ji hev cuda) di çarçewa 256 îmkanan da bimîne. Lê belê hejmara tîp û îşaretên di zimanên seranserê cîhnê da hene, bi gelekî ji 256-an pirtirê. Piraniya fontên ku heya niha tîpên bikaranîn di çarçewa 256 tîp û îşaretan da bi sînorkirî ne û ji lew ra jî bi kêrî nivîsandina hemû zimanan nayên.

Teknîka komputer pir bi lez pêşve diçe. Ji 16 bit bû 32, di pey ra bû 64 û her wisa bi lez diçe, ku komputerên bi 256 bitan jî êdî peyda dibin. Ev yek tê wê maneyê, ku ji aliyê hardware û software va îmkânên gelek mezin peyda bûne. Fontên nû – wek nimûne, eva ku em niha pê dinivîsîn (Arial Unicode MS), gelek mezin in; mirov dikare bi wan heya zimanê Çînî jî binivîsîne. (库尔德人的语言). Heke min ev herdu peyv „kurdish language“ rast wergerandibin zimanê çînî, hîngê bi zimanê Çînî, van îşaretên derbasbûyî tîpên wateya „zimanê kurdî“.

Gava em bala xwe didin klavyayên amerîkî û înglîzî yê destpêkê, em dibînin ku gelek sade ne û tenê tîpên zimanê wan (yanê yê zimanê înglîzî) têde hene. Dema netewe û welatên din sîstema komputer birine û xwestine pê binivîsîn, dîtine ku ji bo zimanên wan hin tîp û îşaretên din pêwîst in, ewên ku bêtir wan nivîsandina zimanê wan ne gengaz û mimkinê. Ji lew ra hin fontên din hatine peydakirin, ku tîp û îşaretên zimanên wan jî têde hebin.

Fontên destpêkê jî tenê li gor zimanê înglîzî hatibûn duristkirin. Gava neteweyên din xwestin zimanê xwe bi wan fontan binivîsîn, dîtin ku hin tîpên zimanê wan di wan fontan da peyda nabin. Ev pirsgerêka han heya niha jî serê me pir diêşîne. Wek nimûne, heger em nivîsekê bi fonteka taybet binivîsîn û di pey ra tîxî fonteka din, dibe ku hin tîp werin guhertin yan jî li cihê wan hin îşaretên din bêne xuyakirin, ku ew di nivîsa bingehîn da tine bûn. Ka em bi vê fonta niha hevokekê binivîsîn û di pey ra veguherînin hin fontên din:

Şeş çivîk bi hev ra ji ser kaniyê firîn. (Font: Arial Unicode MS)

Şeş çivîk bi hev ra ji ser kaniyê firîn. (Font: Times New Roman)

Şeş çivîk bi hev ra ji ser kaniyê firîn. (Font: Arial)

Şeş çivîk bi hev re ji ser kaniyê firîn. (Font: KurdArial)

Şeş çivîk bi hev ra ji ser kaniyê firîn. (Font: A_Celadet)

Şeş çivîk bi hev ra ji ser kaniyê firîn. (Font: Tahoma)

Şeş çivîk bi hev ra ji ser kaniyê firîn. (Font: Verdana)

Şeş çivîk bi hev ra ji ser kaniyê firîn. (Font: Ariosso)

Şeş çivîk bi hev ra ji ser kaniyê firîn. (Font: Courier New)

Em dibînin ku hevoka me di piraniya fontan da rast tê xuyakirin. Lê belê di fonta **KurdArial** û **Ariosso** da tîpa **ş** winda dibe û li cihê wê hin îşaretên din têne xuyakirin. Tevî ku fonta **Ariosso** fonteka pir xweşik'e, mixabin em'ê nikaribin di rewşa îro da wê ji bo Kurmancî bi kar bînin. Mixabin ewên ku fonta **KurdArial** ji fonta bingehîn **Arial** durist kirine, font herimandine û cihê tîpa **ş** yê bingehîn jî guhertine.

Klavya yan jî keyboard

Piştî vê pêşgotina kurt, ka em vegerin ser mijara klavyayê. Haya niha em kurdên ku bi tîpên latînî dinivîsînin, her yek ji me klavyaya welatê ku lê dijî bi kar tîne. Lê belê em ji bo nivîsandina hin tîpên zimanê me, yên wek "ş, ç, ê, î, û" hin zehmetiyan dibînin. Kurdên me, yên ku klavyaya tirkî bi kar tînin, di nivîsandina tîpên "ş, ç" da ti zehmetiyan nabînin. Nivîsandina tîpên bi kumik jî bi klavyaya tirkî mimkin'e.

Malpera NEFEL.COM klavyayeka kurdî daniye, ku di wê da ew tîpên ku ji bo me dibin pirsgirêk, hatine bicihkirin. Mixabin ku danerên vê klavyayê sûd û mifa ji klavyayên welatên din negirtine. Wisa tê xuyakirin, ku wan ev klavya li ser bingeha klavyaya înglîzî-amerîkî ya destpêkî danîne û xwestine tenê mijara van tîpan " ş, ç, ê, î, û" çareser bikin.

Berî ku em dest bi gengeşiyê li ser klavyayeka nû bikin, ka em pêşî binêrin, ev welatên din klavyayên xwe çawa danîne?.

- 1- **Klavyaya almanî:** Di klavyaya almanî da ji bilî 26 tîpên latînî yê bingehîn, tîpên wan yê taybet jî "ä, ö, ü, ß" hatine bi cihkirin. Lê belê di klavyaya almanî da du gupikên ku ji wan ra "dead key" dibêjin jî hene. Taybetmendiya van gupikên "dead key" ew'ê, ku mirov dikare bi arîkariya wan hin tîpên din, yê tenha hin caran pêwîst dibin, binivîsîne. Gelek welatan – wisa jî danerên klavyaya almanî jî – sûd û mifa ji vê taybetmendiya "dead key" wergirtine. Li aliyê rastê yê jor gupika bi kumik (CIRCUMFLEX ACCENT) heye. Gava mirov pêşî li wê bide û di pey ra li gupikekê ji van gupikan (a, e, i, o, u) bide, hîngê ew tîp bi kumik tên nivîsandin û dibin (â, ê, î, ô, û); ev yek ji bo tîpên gir jî wisa ye; yanê (A, E, I, O, U) dibin (Â, Ê, Î, Ô, Û). Kurdên ku klavyaya almanî bi kar tînin, sûd û mifayê ji vê taybetmendiya klavyaya almanî digirin û wisa dikarin tîpên kurdî yê bi kumik binivîsînin. Gupika din ya "dead key" li aliyê rastê, li jor'ê. Li ser vê gupikê herdu nîşandekên fransî (ACUTE ACCENT "´") û (GRAVE ACCENT "`") hatine bicihkirin. Bi arîkariya van herdu nîşandekan, ev hemû tîp dikarin bên nivîsandin: (á, é, í, ó, ú, ý, Á, É, Í, Ó, Ú, Ý, à, è, ì, ò, ù, À, È, Ì, Ò, Ù). Tevî ku ev tîpên bi kumik û ev hemû tîpên bi ACUTE ACCENT û GRAVE ACCENT di alfabeya almanî da tine'ne jî, lê dîsa jî nivîsandina wan bi klavyaya almanî gengaz û minkin'ê. Gelo ev çima wisa kirine?
- 2- Heger em bala xwe bidin klavyaya fransî, em'ê bibînin, ku di klavyaya wan da jî, ji bilî tîpên latînî yê bingehîn, ev tîp jî hene: "à, è, è, ç, ù" û bi arîkariya CIRCUMFLEX ACCENT – gupika bi kumik, ew dikarin van tîpan (Â, Ê, Î, Ô, Û, â, ê, î, ô, û) binivîsînin.
- 3- Di klavyaya holandî da jî, ji bilî tîpên bingehîn, du "dead key" hene, ku ew dikarin bi arîkariya wan van hemû tîpan (á, é, í, ó, ú, ý, Á, É, Í, Ó, Ú, Ý, ä, ë, ï, ö, ü, ÿ, Ä, Ë, Ì, Ö, Ü) bi klavyaya xwe binivîsînin.

Me klavyayên gelek welatên ewropayî û yê bakur û başûrê Amerîka dan ber hev û em gihîştin encamekê. Her welatekî di klavyaya xwe da tîpên bingehîn yê zimanê xwe bi cih kirine û bi arîkariya hin gupikên "dead key" tîpên zimanên cîran yan jî yê ku hin caran ji wan ra pêwîst dibin di klavyaya xwe da bi cih kirine û wisa dikarin – li gor pêwîstiyê – hin caran peyvên zimanên din (wek ku bi wan zimanan tên nivîsandin) bi klavyaya xwe jî binivîsînin. Ev yek bixwe ji pêwîstiyê hatiye. Wek nimûne: Heke em bixwazim bêjin, me pirtûka birêz "André" xwendiyê, divêt em navê wî wek ku heye binivîsînim. Ev jî tenê mimkin'ê heke klavya ji bo vê arîkar be.

Hin welatan ji yekê bêhtir klavya danîne. Amerîka û Inglîstanê gava ku dîtine di klavyaya wan da tîpên welatên din yê Koma Latînî peyda nabin, ew jî rabûne klavyayeka nû bi navê

“english-us-international” danîne, ku di wê da bi arîkariya gupikên “dead key” nivîsandina tîpên zimanên din û hin îşaretên pêwîst gengaz û mimkin’in.

Di piraniya klavyayên welatên ewropayî da, ji bilî tîpên wan yên taybet, îmkana nivîsandina tîpên bi îşaret heye. Ji bo danîna îşaretan li ser tîpan (hin caran jî li bin wan) ev nîşanên taybet têne bikaranîn:

- 1- ACUTE ACCENT, li ser van tîpan tê danîn: á, é, í, ó, ú, ý, Á, É, Í, Ó, Ú, Ý
- 2- GRAVE ACCENT, li ser van tîpan tê danîn: à, è, ì, ò, ù, À, È, Ì, Ò, Ù
- 3- CIRCUMFLEX ACCENT, li ser van tîpan tê danîn : Â, Ê, Î, Ô, Û, â, ê, î, ô, û
- 4- DIAERESIS, li ser van tîpan tê danîn: ä, ë, ï, ö, ü, ÿ, Ä, È, Ì, Ö, Ü
- 5- TILDE, li ser van tîpan tê danîn: ñ, ã, õ, Ñ, Ã, Õ,
- 6- CARON “ ˇ ” : Pir welatên rojhilatê Ewropa vê îşaretê jî bi kar tînin.
- 7- CEDILA “ ˘ ” : Li bin tîpan tê danîn. Herdu tîpên me “ç” û “ş” bi danîna vê îşaretê li bin tîpên “c” û “s” pêkhatine.

Bikaranîna îşareta CARON di klavyaya welatê Çêk da gelek balkêş’e. Bi arîkariya “dead key” ev îşaret li ser van tîpan tê danîn: š, Š, ĩ, Ĺ, ě, Ě, ř, Ř, ň, Ň, č, Č, ž, Ž, đ, Đ, ť, ŧ

Di hemû zimanan da wisa ye, ku ev tîpên îşaretek li ser wan tê danîn, ji bingeha alfabeyê nayên hejmartin. Ew bi danîna van îşaretan, li ser dengên bingehîn, wan dengan yan nerm dikin, yan hişk dikin, yan zirav dikin, yan stûr dikin, yan jî dişiddînin.

Hebûna vê îmkanê ramanek anî bîra me, ku em jî di klavyaya xwe da rê li ber danîna hin îşaretan li ser hin tîpên zimanê me vebikin. Armanc bi ti awayî ne ew’e, ku em hejmara tîpên alfabeya kurdî pirtir bikin. Wek nimûne, zimanê erebî berê bê nixte bû. Di pileya pêşîn da li ser hin tîpan nixte hate danîn, da ku ziman baş bêye xwendin. Di pileya duyem da gava zimanê erebî li nav gelên ne Erebelav bû – da ku ziman bi temamî rast bêye xwendin, esir û stunên wek **fethe**, **demme**, **kesre**, **şedde** û **sikûn** hatin danîn. Bi danîna van îşaretên arîkar, hejmara tîpên zimanê erebî her 28 tîp man, lê xwendina zimên – bi taybetî jî ji bo kesên biyanî – hêsantir bû û êdî rast hate xwendin. Heya niha jî rewş wisa ye, ku di jiyana rojane da, bi zimanê erebî, ev îşaretên arîkar nayên bikaranîn. Tenê ji bo hînbûna ziman bi awayekî durist, li gor pêwîstiyê ev îşaret têne danîn û her wisa, da ku kesên biyanî zimanê erebî rast bixwînin, ev îşaret dibin arîkar; bi taybetî jî di xwendina Qurîanê da.

Gelo tişteki wisa ji bo Kurdî jî pêwîst'e?

Bi rastî, ji salan da gelek gengeşî li ser alfabeya me pêktên. Di van gengeşiyên da herdem pirsgerêka tîpên me yê dudengî (ç - Ç, k - K, p - P, r - R, t - T) û di zaravayê Soranî da tîpa "l - L" tê meydanê. Bi taybetî kurdên me yê komarên Sovyeta berê li ser vê mijarê bi îsrar radiwestin. Lê belê gelek kesên din jî hene, ku vê yekê wek pirsgerêk dibînin. Çiqas em – wek kurdên "Celadet-Parêz" – li hember dîtînan wan derdikevin jî, lê em bixwazin nexwazin, bi rastî jî di hin peyvên da bêyî nîşankirina van tîpan hinek nezelaî peyda dibe.

Bi bîr û baweriya min, divê em êdî di mijara alfabeyê da, xwe ji helwesta dogmatîk rizgar bikin. Divê em nebêjin, ku alfabê ev'e, wek kêrtika hesinî ye û nabe tişteki tede bê guhertin; divê em herdem ji rêforman ra amade bin û bipejirînin; ev zagoneka jiyane ye. Madem pirsgerêk li meydanê hene, divê em çareseriyên jêra bibînin. Alfabê û îşaretên arîkar divê li gor rastîya ziman bin û bersiva her pirsgerêkekê bidin. Helwesta dogmatîk pirsgerêkan dihêle; wan çareser nake. Di her zimanekî da çiqas dengên cuda hebin, divê li hember wan, yan ewqas tîp hebin, yan jî tîp ji dengên ku bi gelemperî tene bikaranîn ra bêne danîn û ji dengên din ra jî, bi danîna hin îşaretan li ser yan li bin hin tîpan, çare bê dîtî.

Em bala xwe bidin zimanê erebî. Gava hên berî dema îslamê alfabeya aramî birine, alfabê 28 tîp bûne; tîpa 27-an lamelêf'e, ku wek tîpeka serbixwe ne pêwîst'e û ti mane jêra nîne. Lê belê heya niha jî alfabeya erebî ji van 28 tîpan pêktê, lamelêf jî di nav da.

Da ku em vê ramana xwe avêne û zelal bikin, em bikaranîna îşaretên arîkar wek "fethe, demme, kesre, şedde, sikon û tenwîn" di zimanê erebî de bînin bîra xwe. Ev îşaretên arîkar di her nivîseka bi erebî da nayên bikaranîn; ew tenha ji bo hînkirina zarokan, ji bo hînkirina biyaniyan û di hin rewşên din yê taybet da, wek xwendina Qur'ânê tene bikaranîn. Piştî ku mirov baş hîni zimanê erebî dibe, ew îşaret nema pêwîst dibin. Ji lew ra, bi dîtîna min, bikaranîna van îşaretên arîkar di zimanê erebî da, bi encama serborî û tecrûbeyeka dîrokî ya dûr û dirêj pêkhatîye û divê em jî sûd û mifayê jê wergirin. Helwesta ku em xwe di her warekî da ji erebî û Ereban bi dûr bixin, ne rast û durist'e. Ew kesên ku ev îşaretên arîkar di erebî da bi kar anîne, dîsa piraniya wan bav û kalên me bûne, ku xwestine mirov bi awayekî rast û durist hîni ziman bibe.

Li ser mijara tîpên dudengî, me di nivîseka din da ev nimûneya jêr dabû:

"Yekî ker û bi çavekî li kerekî boz siwar e, ker dizire û diçe nava kerî. Bêrîvan têne pêşiya wî û dibêjinê: Kuro, kero em dizanin tu ker î, lê çima tu vî kerî tînî nava kerî?. Te sewal tirsandin, kerî ker ker kir û kir sê kerî."

Di vê nimûneya me da, bi rastî jî, heya ku naverok baş bê fêhmkirin, divêt tîpên "k" û "r" hin caran nerm û hin caran jî hişk bêne bilêvkirin. Lê belê, gelo em îşaretê bidin tîpa hişk an ya nerm? Berî ku biryareka giştî ji aliyê dezgehên fermî da tê standin, ka em herdu rêyan jî vekirî bihêlin. Di zimanê Çîkî da îşareta CARON ji bo nermkirina tîpan tê bikaranîn. Lê belê di zaravayê me yê Soranî da, ev îşareta CARON ji bo stûrkirina tîpan tê xebitandin. Ji lew ra wek pêşniyar, ka em îşareta CARON ji bo hişkkirinê bi kar bînin. Jixwe Mîr Celadet îşareta KUMIK(CIRCUMFLEX ACCENT) ji bo tîpên "ê, î, û" bi kar aniyê û îşareta CIDELA jî ji bo pêkanîna tîpên "ç" û "ş" hatiye terxankirin.

Heger em di vê hevokê da – li hin cihan – tîpên hişk bi îşareta CARON û yên nerm bi îşareta CIDELA ji hevdu cuda bikin, hîngê hevok bi vî awayî dibe:

"Yekî keř û bi çavekî li kerekî boz siwar e, ķer dizire û diçe nava ķerî. Bêrîvan têne pêşiya wî û dibêjinê: Kuřo, keřo em dizanin tu keř î, lê çima tu vî ķerî tînî nava ķerî?. Te sewal tirsandin, ķerî ķer ķer kir û kir sê ķerî."

Lê belê, me di vê hevokê da, li her cihekî tîpa hişk û nerm neda xuyakirin, me tenê li cihên ku guman heye, hişkkirin û nermkirina tîpan da xuyanîkirin.

Heger em li her cihekî bidin xuyanîkirin, hîngê hevok wisa dibe:

"Yekî keř û bi çavekî li ķereķî boz siwar e, ķer dizire û diçe nava ķerî. Bêrîvan têne pêşiya wî û dibêjinê: Ƙuřo, ķeřo em dizanin řu ķeř î, lê çima řu vî ķeřî tînî nava ķeřî?. Te sewal řirsandin, ķerî ķer ķer ķir û ķir sê ķerî."

Gelo di warê pratîkê da, dibe ku mirov her tîpekê ji tîpên me yên dudengî li her cihekî hişkbûn yan jî nermbûna wan bide xuyakirin?. Na, nexêr. Belkî hinek bêjin: "Çima na? Ma ne baştir'e, ku em her dengê bi diqet binivîsînin, da ku bi diqet jî bê xwendin?". Sedema here girîng, ku nabe em li her cihekî wisa bikin ev'e: Kurd li her herêmekê van tîpên dudengî mîna hev, nerm yan hişk, bilêvnakin. Wek nimûne, tîpa "p" di hokerên "pêş" û "paş" da li herêmên Serhed û Qefqasan bi awayê nerm tê bilêvkirin, lê li herêmên din ev tîp bi awayê hişk tê bilêvkirin. Gelo tîpa "t" di peyva "tişt" da çawa tê bilêvkirin?. Hin Kurmanc hene, ku tîpa "t" ya pêşîn bi awayê hişk û

ya paşîn bi awayê nerm billêvdikin, lê belê, hin Kurmanc jî hene, ku li herdu cihan jî nerm bilêvdikin. Nimûneyên wisa gelek'in. Ji lew ra, tenê beşek ji peyvan, bilêvkirina awayê tîpên dudengî di wan da, li ba hemû Kurmancan mîna hev'e. Bi temamî ev beşê peyvan divêt bête çespendin û dezgeha fermî ya zimanê kurdî biryarê bide, di kîjan peyvan da daxuyanîkirina vê taybetmendiye pêwîst'e. Lê belê, di klavyayê da divêt ev gengazî û ev îmkan hebe, da ku kesê nivîskar bikaribe vê taybetmendiye bide xuyakirin, heke ew ji wê bîr û baweriyê ye, bêtî daxuyanîkirina vê taybetmendiye, kesê xwendevan dikare wê peyvê yan wê tîpê bi awayekî çewt bi lêv bike; hîngê bila îşaretê bide wê tîpê.

Tenê wek pêşniyar, me ji bo çareserkirina pirsgirêka tîpên dudengî, ev tîp li gel van îşaretan ji nava **Unicode** hilbijartin:

Awayê asayî		Awayê hişk		Awayê nerm	
ç	Ç	ç̣	Ç̣	ç̤	Ç̤
k	K	ḳ	Ḳ	k̤	K̤
l	L	ḷ	Ḷ	l̤	L̤
p	P	p̣	P̣	p̤	P̤
r	R	ṛ	Ṛ	r̤	R̤
t	T	ṭ	Ṭ	t̤	T̤

Hûn dibînin, ku me ji bo hişkkirina hin tîpan îşareta CARON hilbijartiyê. Lê ji bo hişkkirina tîpên "ç, p" û "t"-ya biçûk, me "ç̣, p̣, ṭ" hilbijartine. Sedema vê yekê ew'e, ku me di nav **Unicode** da ji bo van hersê tîpan vêrziyonên bi kumik peyda nekirin. Heke me dîtibana, me yê ew jî bi kumik binivîsandana.

Hin nimûne (mînak):

- Mirovekî keř li kerekî siwar bûbû û kuřiyek li pey bû.
- Pîrê Êzîdiyan piř piř bûbû.
- Em li meydana çîwarçîran li ser giyanê cangoriyan rawestiyan.
- Taya mirinê hatibû wî, ew gelek bê hêz bûbû, ku nikarîbû řa bi derziyê veke.
- Guřî baxekan ře guřî řaxekan ciwantir'e (ev hevok bi zaravayê soranî ye) .

Ji bilî çareserkirina pirsgirêka tîpên dudengî, divêt klavyaya kurdî ji hin îmkanên din ra jî rê vebike, ku ew jî ev'în:

- a) Pirsgirêka şeşeyê û tîpa dubare.
- b) Pirsgirêka dengên biyanî.

A) Pirsgirêka şeşeyê û tîpa dubare: Mîr Celadet Bedirxan gotiye, ku di Kurmancî da şeşê nîne. Ji ber vê sedemê jî wî tîpa dubare bi giştî qedexe kiriye. Li her cihêkî, ku bi awayekî surîştî jî tîpa dubare di peyvan da peyda dibe, gotiye, ku divêt tîpa pêşîn ji tîpa dubare bête avêtin (wek mesela ku "xurttir" bibe "xurtir"). Ne bi tenê ev jî! Gotiye, ku gava tîpên ji yek cihderkê jî di peyvan da têne ba hev, divêt dîsa ya pêşîn bête avêtin (wek mesela ku "bilindtir" bibe "bilintir"). Bi rastî jî, min demeka dirêj bawer kir, ku Mîr Celadet di vê dîtina xwe da mafdar'ê; min jî bawer kir, ku şeşê di zimanê me da tine ye û divêt em rê nedin tîpa dubare jî. Lê belê piştî demeka dirêj û lêkolînên gelek hûr di vî warî da, ez gihîştim wê baweriyê, ku belê Mîr Celadet ev pirsgirêk naskiriyê, lê mixabin di dayîna biryara xwe da li ser vê pirsgirêkê ketiye pey qeyda zimanê devkî û wisa biryara xwe şaş daye. Li gelek cihên din, wî reseniya peyvê parastiye, lê di vê babetê da reseniya peyvê ji qeyda zimanê devkî ra kiriye qurban. Ji lew ra, ez di vî warî da ji neçarî, ji mecbûrî li dijî dîtînan mamosteyê xwe'yî mezin derketim, ku rêz û hurmeta min bê sînor jêra heye. Min ji zû da li ser vê mijarê nivîsandiye û vê dîtîne êdî li ba gelek zimanzanan û di rastiya ziman da jî cih girtiye. Kesê ku bixwaze, dikare nivîsên min yê li ser vê mijarê bixwîne. Qedexekirina tîpa dubare, wek biryareka rêzimanî li ber pêşveçûn û dînamîkiya zimanê me dibe asteng. Zimanê me wisa ye, ku kesê nivîskar di gelek waran da neçar dibe, du peyvan li hev siwar bike û bike yek peyv û bi pişadî (tesaduf) dikare tîpa paşîn ji peyva yekem û tîpa pêşîn ji peyva duyem yek tîp be û wisa di peyva siwarkirî da tîpa dubare peyda bibe. Hîngê heke tîpa pêşîn ji tîpa dubare bê avêtin, maneya peyvê dikare winda bibe û nema bê fêhmkirin. Ev herdu peyvên ku li hev têne siwarkirin, dikarin,

- 1) Du navdêr bin, wek: serok + komar = serokkomar. Nimûne: Pirsê serokkomariyê li Tirkiyê gelek tê gengeşekirin.
- 2) Navdêr û lêker bin, wek: kasêt + tomarkirin = kasêttomarkirin. Nimûne: Zozan ji bo kasêttomarkirinê çû Amedê.

- 3) Jimarnav û navdêr bin, wek: yek + kîte = yekkîte. Nimûne: Bêjeyên yekkîteyî jî di zimanê me da hene.
- 4) Jimarnav û rengdêr bin, wek: nîv + vekirî = nîvvekirî. Nimûne: Ew çû û derî li pey xwe nîvvekirî hêşt. Yan jî wek peyva "nîvvala".
- 5) Navdêr û rengdêr bin, wek: dev + vekirî = devvekirî. Nimûne: Min îşev di xew da marekî devvekirî dît, ku ber bi min va dihat.
- 6) Navdêr û rengdêr bin, wek: reng + girikî = renggirikî. Nimûne: Av renggirikî bûbû.
- 7) Rengdêr û lêker bin, wek: teng + kirin = tengkirin. Nimûne: Wê li firoşgehê ji xwe ra fîstenekî xweşik û erzan kirî, lê divêt hinekê bê tengkirin.

Em dikarin bi sedan peyvan bînin, ku herdem gengaz û mimkin'e, tîpa dubare, yan jî du tîpên ji yek cihderkê di siwarkirina peyvan da peyda bibin. Lê belê, avêtina tîpa pêşîn ji tîpa dubare, yan jî ji herdu tîpên ji yek cihderkê, maneya peyvê têkdide û nema tê fêhmkirin. Ji lew ra, ji bo paratina reseniya peyvê û ji bo ku peyv bê fêhmkirin, divêt ev tîp bêne parastin; ne baş dibe, heke ew bêne avêtin.

Niha jî em bêne ser mijara şedejê, ku em li vir bi mebest binê wê xêz dikin. Ji ber ku Mîr Celadet gotiye, ku şede di Kurmancî da nîne, min demeka dirêj bawer dikir, ku bi rastî wisa ye. Lê belê gava min pirtûka birêz Deham Abdulfetah xwend û rastî nimûneyên ku dane hatim, min dît, bi rastî jî hin peyvên zimanê me hene, ku şede di wan da heye. Nimûneyên ku birêz D. Abdulfetah dane, wek: "diz̄ek, vir̄ek, pîr̄ek, mîr̄ek û hwd.", vê rastiye diselmînin, ku çiqas kêmbin jî, lê hin peyv di zimanê me da hene, ewên ku bêyî şedejê maneyeka din distînin. Bi rastî jî, gava em peyva "dizek" bê şede bilêvdikin, tê maneya "yek diz", lê gava em bi şede bilêvdikin, tê maneya ew kesê ku herdem diziyê dike. Her wisa jî peyva "virek", gava bê şede tê bilêvkin, ew maneya "yek vir" distîne, lê gava bi şede tê bilêvkin, dibe ew kesê ku herdem derewan dike. Peyvên "pîrek" û "mîrek" jî wisa ne. Maneya ya pêşîn ne "yek pîr"-e û maneya ya duyem jî ne "yek mîr"-e; ev taybetmendiyeka din'e, ku em diavêjin ser hin mirovan.

Tevî ku di hin zimanan da – li gor biryara zimanzanên wan – pirsgirêka şedeyê bi tîpa dubare çareser dikin, lê belê di bingehê da, şede û tîpa dubare du mijarên ji hev cuda ne. Pirsgirêka hişkkirina tîpan jî ji mijara şedeyê û tîpa dubare cuda ye. Di peyva "serokkomar" da, ku tîpa dubare pêk hatiye, em dibînin "k"-ya pêşîn nerm û "k"-ya paşîn hişk'e. Gava em di peyva "serokkomar" da tîpa "k" hişk dibihîsin, ne ji ber pêkhatina tîpa dubare ye; ev jî ber wê yekê ye, ku tîpa "k" di peyva "serok" da nerm'e û ya di peyva "komar" da hişk'e. Di bilêvkirina tîpa dubare da, em herdem giranahiyê didin ser tîpa duyem. Ji lew ra, em "k"-ya hişk dibihîsin. Di peyva "hişkkirin" da herdu "k" jî nerm'in, ji lew ra jî em tîpa "k" nerm dibihîsin. Heke taybetmendiya tîpa dubare û taybetmendiya hişkkirinê yek taybetmendî bûna, diviyabû me herdem dengê hişk bibihîsta. Lê belê ne wisa ye. Va ye, di peyva "hişkkirin" da tîpa dubare pêk hatiye, lê em dengê nerm dibihîsin. Ji lew ra ne baş'e, ku em taybetmendiya hişkkirinê bi tîpa dubare çareser bikin. Di peyva "nîvvekirî" da du tîpên "v" gihane hevdu û em baş dizanin, ku tîpa "v" ne ji tîpen dudengî ye. Yanê dirûvê wê yê hişk tine ye; em bixwazin jî, em nikarin di van peyvan da tîpa dubare bi awayê hişk bilêvbikin.

Taybetmendiya şedeyê jî ji taybetmendiya hişkbûnê cuda ye. Di peyvên "dîzek, ciñek, çîlek, ..." da şede heye û ev tîpên "z, n, l", ku têne şidandin ne ji tîpên dudengî ne. Yanê em nikarin taybetmendiya şidandinê bi hişkkirinê çareser bikin. Peyvên "pîrek" û "mîrek" bi awayekî gelek aşkere diselmînin, ku pêwendiya taybetmendiya şidandinê bi taybetmendiya hişkkirinê ra tine ye. Tevî ku di van peyvan da tîpa "r" ji tîpên dudengî ye jî, lê tevî şidandinê jî, ew bi awayê nerm têne bilêvkirin. Tîpa "r" di peyva "vîrek" da, ku hişk têye bilêbkirin, ne ji ber taybetmendiya şidandinê ye, lê belê ji ber wê yekê ye, ku tîpa "r" di peyva "vîr" da hişk têye bilêvkirin û wisa jî ev taybetmendiya xwe di peyva "vîrek" da jî parastîye.

Di vê dema dawî da, hin nivîskarên me hewl didin, ku hişkkirina hin tîpan bi tîpa dubare çareser bikin. Di gelek malperên înternêta da, mirov dibîne, ku rengdêra " pîr " bi awayê "pîrr" nivîsandine. Lê belê – bi dîtina min – ev ne durist'e. Wek ku me li jor da xuyaîkirin, ev hersê taybetmendî (tîpa dubare, şidandin û hişkkirin) ji hevdu cuda ne. Sedema ku hin nivîskar wisa dikin ev'e:

Ji ber ku di zimanê me da heya niha jî hên pirsgirêka tîpên dudengî nehatiye çareserkirin, hin kes hewl didin, ku bi awayekî ji awayan çareyekê jêre bibînin. Belê prof. Qenatê Kurdo çareyek ji pirsgirêka tîpên dudengî ra daniye, lê belê ji ber van herdu sedeman, çareserîya ku wî daniye di nav kurdan da cih negirtiye,

- a) Mixabin ku prof. Qenatê Kurdo ji bo xuyakirina taybetmendiya HIŞKKIRIN û NERMKIRINÊ îşareta APOSTROF bi kar aniye, ku li paş tîpan têye danîn. Ev yek nivîsê gelek têkil dike. Di zimanên din yê cîhanê da, îşareta APOSTROF ji bo cudakirina du peyvan tê bikaranîn, ku ew ji aliyê sêmantîk va du peyv'în, lê ji aliyê bilêvkerinê va, wek peyvekê tene bilêvkerin. Ji lew ra jî, me di vê nivîsa xwe da lêkera BÛN ji peyva pêşîya wê bi APOSTROFÊ cuda kiriye, gava ew peyv bi dengdarekê diqede.
- b) Mixabin ku prof. Qenatê Kurdo xwestiye li her cihekî taybetmendiya HIŞKKIRIN û NERMKIRINÊ bide xuyakirin, ku li hemû herêmên Kurmancî ev taybetmendî ne mîna hev'e. Ji hêla din va taybetmendiya HIŞKKIRIN û NERMKIRINÊ li her cihekî yan jî di her peyvekê da nabe pirsgirêk. Di piraniya peyvan da ne pêwîst'e em taybetmendiya HIŞKKIRIN û NERMKIRINÊ bidin xuyakirin. Wek nimûne: Bi ti awayî ne hewce ye, em peyva "Kurd" bi awayê "Kurd" binivîsînin.

Em baş dizanin, ku tîpa "r" di destpêka hemû peyvan da bi awayê HIŞK têye bilêvkerin û ji lew ra, ne hewce ye, em vê taybetmendiye li hemû cihan bidin xuyanîkirin.

Dibe ku hin kes bêjin: Ê da baş'e! Tenê kesê ku zimanê Kurmancî baş dizane, dizane li kîjan cihî tîpa dudengî yan HIŞK yan MERM tê bilêvkerin, em'ê kesên biyanî yan jî zarokên biçûk çawa hînî kurmanciyeka rast bikin?. Ji hêla din va, kî dibêje, ku her kurdek her peyveka Kurmancî nasdike?. Bê guman, ev herdu pirs jî mafdar û di cih da ne.

Em bi xuyakirina taybetmendiya HIŞKKIRIN û NERMKIRINÊ ti tîpên nû li alfabeya Kurmancî zêde nakin. Mijara daxuyanîkirina vê taybetmendiye divêt tenha wek

gengazî yan jî îmkaniyeka arîkar bê fêhmkirin, ku em tenha ji bo hin peyvên taybet û di hin babetên pêwîst da bi kar bînin.

B) Pirsgirêka dengên biyanî: Rewşa cîhanê wisa ye, ku roj bi roj dan û standina gel û neteweyan, bi çandên xwe yên cuda, li gel hev xurttir dibe. Di vê pêvajoya berdeham da, ne tenha nav, gelek peyv û têngên din jî ji zimanekî derbasî zimanên din dibin. Vê pêvajoya han ji kûraniya dîrokê da dest pêkiriye. Kîjan gel û netewe di warên siyasî, çandî û olî da ji yên din xurttir bûye, peyv û têngên wan derbasî zimanê gel û neteweyên din bûne. Ji lew ra, di hin demên dîrokî da peyvên zimanê me derbasî zimanên din wek erebî, tirkî û farisî bûne. Lê di hin demên din da jî peyvên wan derbasî zimanê me bûne. Di dema îro da jî gelek peyvên ji zimanên ewropayî derbasî zimanê me dibin. Ji bo hin peyvên gelek durist'e, ku em li hember wan di zimanê me da jî peyvekê peyda bikin. Lê belê ji bo hin peyvên din ne durist'e, ku em wisa bikin; divêt em peyva bingehîn, wek ku heye bi kar bînin. Heger tenê ji bo sîtatan (citation) be jî, divêt em bikaribin tîp yan jî dengên ku di wan zimanan da hene bi klavyaya xwe binivîsînin. Pir welatan ji xwe ra, ji klavyayekê bêhtir danîne. Bi dîtina min, ji me ra du klavya pêwîst'în, yeka kurdî-ewropayî û yeka kurdî-rojhilatî. Di ya kurdî-ewropayî da divêt bi arîkariya "dead key" danîna îşaretan li ser hin tîpan gengaz û mimkin be, wek: á, é, í, ó, ú, ý, Á, É, Í, Ó, Ú, Ý, à, è, ì, ò, ù, À, È, Ì, Ò, Ù, Â, Ê, Î, Ô, Û, â, ê, î, ô, û, ä, ë, ï, ö, ü, ÿ, Ä, È, Ì, Ò, Ü, ñ, ã, õ, Ñ, Ã, Õ. Di klavyaya kurdî-rojhilatî da, divêt bi arîkariya "dead key" nivîsandina tîp yan jî dengên ku di zimanên rojhilatî da hene gengaz û mimkin be. Di vê babetê da dengên ku di zimanên farisî û tirkî da hene nabin pirsgirêk, lê belê dengên ji zimanên samî dibin pirsgirêk.

Awirek li Alfabeya Erebi:

Alfabeya Erebi ji Alfabeya Arami wek ku hebû hatiye birin. Bi vajayî welatên ewropayî, ku gava Alfabeya Latîni birine û hin tîp lê zêde kirine yan jî hin îşaret danîne ser yan bin tîpan, ereban di birina Alfabeya Arami da ti pisporî nekiriye û qet hewl nedaye, ku hin tîpan zêde bikin yan jî hin îşaretan deynin ser, yan jî bin hin tîpan ku li gor zimanê wan pêwîstî pê heye. Alfabeya Erebi ku ji 28 tîpan pêk tê, di rastiyê da ji bo zimanê erebi xwedî kêmasiyên mezin'e. Li hêlekê tîpa 27-an (lam-

elêf) ku ji tîpa "J" û tîpa "I" pêk hatiye – ji ber sedemên dîrokî – wek tîpeka serbixwe hatiye birin, lê belê dengên kurt (fethe, demme, kesre) û hemze (ع) di destpêkê da qet wek pirsgirêk nehatine dîtin. Di destpêkê da nixtik jî li ser tîpan tine bûn. Lê belê bi belavbûna ola îslamî ra, zû dîtin, ku xwendina zimanê erebî, bi taybetî ji hêla kesên biyanî va, ne gengaz û mimkin'e. Di gava pêşîn da neçar man, ku nixteyan deynin ser yan bin hin tîpan (ب, ت, ث, ج, ذ, ز, ش, ض, ص, ط, غ, ف, ق, ن, ي) û wisa pirsgirêk hinekê sivik bû, lê dîsa jî xwendina zimanê erebî ji bo biyaniyan hên gelek dijwar bû. Di pileya duyem da, li cihê ku dengdêrên kurt li alfabeyê zêde bikin, rabûne "fethe, demme, kesre" bi kar anîne. Fethe di rastiyê da a-ya kurt'e (di kurdî da tîpa "e"), demme jî û-ya kurt'e (di kurdî da "u") û kesre jî î-ya kurt'e (di kurdî da "i"). Lê belê van hersê îşaretan jî dîsa pirsgirêk bi temamî çareser nekiriye û ew neçar mane, ku sê îşaretên din bi kar bînin, ew jî ev'in: "sikun َ, şede ِ, tenwîn ّ". Lê belê pirsgirêka hemzeyê bi tîpeka serbixwe nehate çareserkirin; ew li gor rêzikên giramêrê hin caran li jor, hin caran li jêr û hin caran jî hema li ser xêzê têye danîn. Ji hêla din va, gava em bala xwe baş bidin zimanê erebî, zarava û devokên wî yên cihêreng, em dibînin ku hin deng di wan da hene, wek dengdêra "ê" û dengdara "ç", ewên ku di nav 28 tîpên alfabeya erebî da peyda nabin. Peyvên wek "hîç" (yanê wisa) yan jî "lêş" (yanê çima) tenha hin nimûne ne.

Pirsgirêka nivîsandina peyvên ji zimanê erebî bi alfabeya kurdî:

Tenha beşek ji dengdarên alfabeya erebî di alfabeya kurdî da peyda nabin, ku ew jî ev'in: "ث, ذ, ح, ع, غ, ط, ص, ض". Mirov dikare van dangan bi van tîpên ji alfabeya latînî çareser bike "š - Š, z - Z, h - H, ě - Ě, x - X, t - T, ž - Ž, š - Š, đ - Đ". Dimîne mesela hemzeyê, ku ereban wek tîp nedîtiye. Em dikarin hemzeyê bi vê tîpê " ı " nîşan bidin. Bê guman, ev bi tenha pêşniyar'e.

Dengên latînî ji bo dengên erebî (pêşniyar)				
Erebî	Latînî Biçûk	Latînî Mezin	Kod ji bo Biçûk	Kod ji bo Mezin
ث	š	Š	(Alt + shift+ control + >) + s	(Alt + shift+ control + >) + S
ذ	z	Z	(Alt + shift+ control + >) + z	(Alt + shift+ control + >) + Z
ح	h	H	^ + h	^ + H
ع	ě	Ě	ˇ + e	ˇ + E
غ	x	X	^ + x	^ + X
ط	t	T	(Alt + shift+ control + >) + t	(Alt + shift+ control + >) + T

ظ	ẓ	Ẓ	^ + z	^ + Z
ص	š	Š	(Alt + shift+ control + >) + ş	(Alt + shift+ control + >) + Ş
ض	ḏ	Ḍ	(Alt + shift+ control + >) + d	(Alt + shift+ control + >) + D
ء	ĭ	Ĭ	˘ + i	˘ + I

Heke em peymaneka weke vê, yan jî yeka din, ku dişibihe vê, ji xwe ra deynin, em'ê bikaribin her sîtateka ji zimanê erebî jî bi tamamî bi alfabeya xwe nîşan bidin. Wek nimûne, em bi kurdî dibêjin: Hedîsên cenabê pêximber. Lê belê di erebî da peyva "hedîs" bi awayê "hediş" tê bilêvkirin. Yan jî navê dîroknaşê Erebi-Teberî, bi zimanê erebî tîpa "T" bi awayekî stûr tê bilêvkirin û bi awayê "El-Teberî" tê xwendin. Wisa em dikarin ji bo kesê ku bi erebî nizane, bidin xuyakirin, ku ev deng ne mîna dengên tîpên latînî yên naskirî ne.

Heke me li ser notatsiyoneka wisa li hev kir, em'ê bikaribin gelek peyvên ji zimanên samî – bi taybetî ji zimanê erebî – ku di zimanê me da tene bikaranîn, yan jî sîtatên ji zimanê erebî, bi dîqqet binivîsîn.

Hin nimûne (mînak):

- Mehfûz Maî çû ba Meşûq Xeznewî.
- Mihemedê Êelî dît ku hespek di maxê da mexeliye.
- Kurdên herêma Behdînan peyva "seg" bi awayê "şeg" bilêvdikin. Yanê tîpa "s" pir stûr tê bihîstin.
- Peyva "zalim" ji zimanê erebî ketiye zimanê me, ew di erebî da bi awayê "zalêm" tê bilêvkirin. Li hember vê peyvê, di zimanê me da peyva "zordar" heye.

Serinc: Me ji bona nivîsandina van tîp û van îşaretan klavyayek danî. Kesê ku bixwaze, dikare vê klavyayê li ba xwe siwar bike. Divêt bête zanîn, ku ev hemû tîp û îşaret tenha di fonta "Arial Unicode MS" da peyda dibin. Di fontên din da, hinek ji wan hene, lê belê hinên din jî tine ne.

Homburg, 27.11.2007

Moustafa Rechid, mrechid@pen-kurd.org